



ANE - Çêklîsta bo beşdarbûna dayîkbavan li Kîta'yê

Niha zaroka we diçe navenda muqateya zarokan. Dema hûn zarok bûn, ew çawan bû? Teqez, gelek tişt îro ji wextê hûn zarok bûm ve cuda ne. Wareta muqateya bo zarokên ciwan li Almanyayê dikare ji welatê hûn lê mezin bûne cuda be.

Em hez dikin ser vêya hin têbîniyan bidin ku hûn wekî dayîkbav dikarin li navenda muqateya rojane de beşdar bin û piştê li serdema muqateya rojane de baş bi zaroka xwe re bin.

KÎTA LI BERLÎNÊ ÇAWAN KAR DIKE?



Hûn dikarin li pêvajoya biryardayînê de beşdar bibin

Hûn wekî dayîkbav dikarin li Kîta'yê beşdar bibin, xwe agahdar bikin û beşdar bin.



Erka wan a hevbeş a perwerdeyê heye

Li gor Qanûna Xurtkirina Muqateya Rojane ya Zarokan a Berlînê, navendên muqateya rojane bo „perwerde, mezinkirin û muqateya“ zarokan in. Lê elbete, hûn wekî dayîkbav hîn ji berpîrsên perwerdeya zarokên xwe ne. Baştirîn tişt bo zaroka we wê demê ye dayîkbav û Kîta bi hev re kar bikin.

MALBATA ME ÇAWAN JI BEŞDARBÛNA LI MUQATEYA ROJANE SÛD WERDIGIRE?



Zaroka we hez dike biçe muqateya rojane

Perestariya niha beşeke girîng ji jiyana rojane ya zaroka we ye. Zaroka we dê pirtir ji çûyîna wir lezetê bibe wexta bibîne hûn li jiyana muqateya rojane beşdar dibin.

Eger hûn li perestariyê arîkariyê bikin (wek mînak, anîna xwarina xweştehm bo taştêya komê), zaroka we dê şanaziyê li we bike).



Hûn ê zanyariyan wergirin

Ew dîzanin li perestariyê de çî dibe û di wextê de ji tiştên nû agahdar bibin.



Hûn dayîkbavên din nas dikin

Hûn dikarin bi dayîkbavên din re danûstandinê bikin, renga hetanî bi zimanê xwe yê dayîkê. Hûn ê ji dayîkbavên ku pirtir li vir jiyane zanyarî û têbîniyan wergirin.

ÇAWAN DIKARIM BO DAYÎKBAVÊN DIN RE BIKEVIM NAVA TORRAN?



Civîn yan axaftinên bi çeta vîdyoyî bi dayîkbavên din re

Li koma zaroka xwe de dayîkbavên din baştr nas bikin!

Dem a hûn zaroka xwe dibin çend deqeyan zêdetir dayînin û bi dayîkbavên din re biaxivin. Wisan bikin zarok bi hev re bilîzin.

Hûrgiliyên pêwendiyê bidin û bistînin û bila pêwendiya we bi hev re hebe.

ÇAWAN DIKAARIM BEŞDAR BIBIM?



Êvara dayîkbavan

Biçin konferansên rêkpêk ên dayîkbav-mamosteyan.

Hemû dayîkbavên zarokên komeke muqateya rojane li êvarên dayîkbavan bi mamosteyên lêveger re hevdîtîne dikin. Ew li wir gelek zanayariyan werdigirin.

Eger hûn (hîn) zimanê Almanî baş nizanin, ji pêş ve ji birêveberiya perestariyê re bibêjin. Ji kesên din daxwaz bikin hêdî biaxivin. Yan kesekî bi xwe re bînin bo we wergera devkî bikin.



Nûnerên dayîkbavan

Hûn dikarin wekî nûnerê dayîkbavan werin hilbijartin.

Hûn wekî nûnerê dayîkbavan erka we ya navbeynkariyê heye nava dayîkbavan, perwerdekarên û birêveberiya zarokistanê. Hûn pêwendiyê pêbawer, zanyariyên duyalî û rêkarên hevbeş piştrast dikin. Li Kîta'yên mezînan de, hûn ê li Komîteya Dayîkbavan beşdar bibin ku nûnerên dayîkbavên ji hemû koman tê de hene.



Konseya Dayîkbavan

Eger pêkhînerê muqateyaa rojane çend navendên muqateya rojane bi rê ve dibe, konseyeke hevbeş a dayîkbavan dikare ser daxwaza dayîkbavan were çêkirin ku komîteya dayîkbavan endamêkî bo wê hildibijêre.



Komîteya Kîta'yê

Li navendên muqateya rojane yê ji 45 zarokan pirtir, komîteyê navenda muqateya rojane heye. Tê de nûnerên dayîkbavan, nûnerên karmendan û nûnerê pêkhînerê muqateya rojane hene.

Komîteya Kîta'yê ser mijarên wekî karê karmendan, dema girtinê yan têgeha perwerdeyê nîqaş dikin.



BEAK û LEAK

Hûn wekî nûnerê dayîkbavan dikaarin li asta deverê yan eyaletê ji beşdar bibin: li BEAK (Bezirkselfenausschuss Kindertagesstätte) û li LEAK (Landeselfenausschuss Kindertagesstätte).



Kîta-Förderverein

Hûn dikarin bibin endamê Kîta-Förderverein. Ew bi rêya projeyan, wek mînak çêkirina erdê listîne piştevaniya zarokan li Kîta'yê dike.

Hûn dikarin bi nêrîn, karê çalak yan arîkariya diravî destekê bidin.

Eger li Kîta'ya we encumena piştewaniyê tunebe, hûn dikarin binyada wê bi kesên din ên xwedan vîn (dayîkbav, hevoarên ji dorberê) birêxistin bikin.



Arîkarî û rêxistina mêvaniyan yan derketina derve

Dem a Kîta bernameyê datîne arîkariyê bikin. Bo vêya pêdivî nake rewşeke we ya „fermî“ hebe û pêwîst nake zimanê Almanî pîrr baş bizanin.

Mînakên çalakiyên wiha: Fîrotîna tiştên pehtî bo yarmetiyê, mêvaniya havînê, seferên derveyî bajêr, roja mijarê, projeya xwendinê. Wek mînak, hûn dikarin arîkariyê bikin bi: anîna salad yan vexwarinê, lêdana muzîkê bi zarokan re, xemilandina perestariyê, bi zarokan re çûyîna sefera derve, xwendina ji zarokan re (bi zimanê xwe yê dayîkê).



EM WEKÎ DAYÎKBAV LI KÎTA'YÊ ÇI MAFÊN ME YÊN ZELAL HENE?



Mafê zanyariyan

Mafê we heye ser pêşketina zaroka xwe zanyariyên birêkpek wergirin.

Eger pirsên we hebin yan pêdivî ye bi axivîn, hûn hertîm dikarin bi perwerdekarên re dema hevdiîtinê diyar bikin.



Mafê destgihîştinê û beşdarbûnê

Hûn dikarin li serdema cîwarbûnê bi zaroka xwe re bin û herwiha li karê rojane li koma muqateya rojane piştî wê – bi diyarkirina ji pêş ve – beşdar bibin.

Hûn dikarin bibin beşeke wê: Divê perestari karên hevbeş nava dayîkbavan û zarokan han bide. Hûn dikarin li cejn û seferên derveyî bajêr beşdar bibin.

Gotineke wan heye: Navenda muqateya rojane divê biryarên dayîkbavan, bi taybet eger têkildari xerc û mesrefê bin (wek mînak, bernameyeke zêde ya werzişê ku bi dirav e) berçav bigire.

Herausgeber



Arbeitskreis
Neue Erziehung e.V.
Großbeerenstr. 184
12277 Berlin
ane@ane.de

www.ane.de
www.schueltern.berlin

Gefördert durch



PARTIZIPATIONS- UND
INTEGRATIONSPROGRAMM

Spendenkonto

Bank für Sozialwirtschaft
IBAN: DE33 1002 0500 0003 2963 02
BIC: BFSWDE33BER
Kennwort: Spende

Gestaltung
Yesser Afghani

© ANE 2021